Divê gotara nîv vekolînda dê hewil deyn gerîyanekê dinav gelerîya nîgarikêş (Kemal heraqî) da bikeyin û dîtin û boçûnên xwe liserihunerê şêwekaryê bigiştî wilcem hunermend (Kemal) bitaybet înme ser ziman zêdebarî şirovekirina çend kevalan ji baxê gelerîya (Kemal heraqî). Dibe ez dişirovekirin û dîtinên xweda ne gelek yê serkeftî bim çunke ev xwandine ya wergirekî neyî pispure diwarê şirovekirina hunerê şêwekarî da belku pitirîya hezjêkerekî vî corê hunerî ye, min amaje nedaye hindek putepêdanên din yên (Kemal heraqî) mîna xweşnivîsyê û peykersaziyê çunke eve tenê gerîyanek bû dimalpera vî hunermendîda ku amîza çend kevalên şêwekarî dike. Helbet aşikiraye ku (Kemal heraqî) lipey xweyndingeha sirîyalî diçe tevî rewanbîjîya derbirînî, zêdebarî bikaranîna qelem risasî, her ji destpêka afirandina mirovayetyê liser royê erdî, mirov hewil wibzavên derbirînê ji xwe dike û yê berdewame li hemû dem û hîwana tenê amiraz û şêwe dihêne guhurîn lê merem û mebest yek e û her tim azadî dinav palçeyên vê derbirîna hanî da ya amede ye, azadyê licem nîgarikêş (Kemal) wateyeka taybet heye ku mercekî afirandinê ye, afirêner bigiştî dinav hest û nestên xweyên her tim azirandîda dişewetit, û biderxistina karekî mirovatî bikare mirovatîya mirovan ji kolatîya dûbarekirinê aza bike û ez bi bawerim (Kemal) jî divê hêlêda xebitî ye û lidor azadîya ramanên xwe bezî ye lewra kuçeberî elmanîya bûye daku bikare hajîbûn û hezên mirovatyê bîrubawer û efsane binav bike wêneyên xwedan gewide, (kimal) karî xwe azad bike lê bidîwarê xwastekên jîyaneke nwî rast hat lewra jîyana wî ya nwî nebû harîkar jibo pişkdarîyan divîstevalande bike û xwe pitir pêşibêxe dibe heya radekî karîbe mifayî ji ezmûnên hunermendên elman werbigire, çunke kuçberîya wî ya bixurtî wibnbir bû û jîyana penaberyê rêkixoşker bû jibo bidestiveynana azadîya wî

dixwest jibo vejandina hizran lê li rexê din, dem û xwastekên jîyanê, barê abûrî û... Hitid fakterên aluzker û rêgirbûn ku karwanê afirandinê licem (kimal) neyî lezgînbe!

Çunke ez (Kemal heraqî) jinêzîkive dinasim, ez dikarim bêjim ew hez liwelatê xwe dike û hezêkirineke bê sînor beramberî mirovatyê heye yê dilvekere jibû her kesê girinjînekê arastey wî bike û xwedan nameyek e hunerî ye û jimafê me ye em bêjin (Kemal) xwe kirî ye qurban jibo gehandina nameya xwe ya mişt ji sembolên mirovatyê û dûrîyek e hunerî a bilind zêdebarî nirxên pirbeha dinama wî de hene, helbet ev sembolên hanê diberihemên wî yên hunerî da xoya dibin, her tim avirîner xwe li kulturî bi hemû coranive dikene xweyê çunke (kultur) nasnama kesatîya her neteweyekî zelal dike, Kurdistan landka şarstanîyetê pir caran tûşî wêrankirinê bû lewra ez dibînim avirîner diberpirsin ji serastkirina rewş û hebûn û vegerîyan jibo nejadê xwe, millet dîrokê çêdike ew millet ji kul û kuvan û şkestina bilindtir in, dibîyava mifa wergirtin ji kulturî (kimal) karî ye bi şêweyekî sakar piroseya nîgarikirina xwe bêxe di raja vî kulturî hanîda û di heman demîda beruvajî jî anku kultur êxiste di xizmeta bilindkirina astê berihemên xweyên hunerî da wikarî ye heya radekî biparastina kulturî rabibe û wisa têdigehe ku xwe guncandin ligel vî serdemî ne pişt guh havêtina kulturê me ye. Hunermend (Kemal) yê zale liser amiraz û alavên xweyên karî lewra yê berihemdar e lê carina begirawendî û jîyana wî ya nepenîda çapkirî serî jê disitîne û berî hizirên dî dide bîyava tulivekirinê çunkî ew malbateka pêkhatî ji "9 "zarokan, tevî day û Baban da mezin bûye û divan 31 salên jîyana xweda ku gelek dibin bandora perwerdeya babê xwe Mamosta (xelat) da bûye ku hizirên kumînstê divê malbatê da di azad û serfiraz bwîne. Gutinên (stem û zordarî û kuledarî û seriheldan dijî ketixwar û serokên zulmdar... Hitid) di pirbûyine, lewra heya niha jî (Kemal) nikarî ye xwe jivan hizran qurtall û reha bike û eve di kevalên wîda baş xweya dibe û ez bitulivekirin dideme nasandin, lewra jî caran eve nebûye harîkar jibo avirandinê, afirîner yekemîn wergirê karê xwe yê hunerî ye helbet cudahîya wergiran girêday cudahîya astên wan yên rewşenbîrî û civakî û hunerî ye lê liser yek xalê rêkikeftîne, ew jî hewildana wane jibo têgehiştina nehênî û nepenyên karê hunerî yên ku hertim nwî dibe bi amîzkirina têgeh û hizirên nwî daku nirxên hunerî zêde bike, çi di heman demîda yanjî piştî demekî din ku xweşî û lezet jê bê wergirtin.. (kimal heraqî) hewldde ku pir nirxên biha û sincên hunerî ji xwere bike peyrew û rêkixweşker jibo destiveynana van armancan:

1-Bizava hişîyarikirina civatgehê me.

2-Destnîşankirina xalên şaşî nemaze ew kesên dînî bikar dînin dûr ji rolê dînî yê asay û xwezay ku arastekirina civatgehî jibo rastyê û sincên baş û dûr ji xerabikarîyan.

3-Azakirina wijdanî.

4-Ronahîya zanisitî.

5-Rengivedana rewşa civatgehê bigiştî û çaverê çareserîyan dike.
6-Berihemê hunerî şêwazekî giring e jibo gehandina hizran.

Lidor ciwankaryê (xoşkokyê) di hunerê nîgar kêşyê da pitir ji boçûnekê (dîtinekê) ligavê heye.. Tê gotin ku ciwankarî di bersivdan û lidwîv hatina xweyetî yame lijêr bandora fakterek der ve ankûya vê gotinê ciwankarî di nax û xûyetîya meda cihgire û bikartêkirineka der ve em hest bi ciwanî û xişkokîyan dikeyin (ciwankarî–Xişkokî–Dileş û naxê meda heye neku diwê tiştê em dibînîn da). Boçûneke din heye dibêje ku xişkokî dikarê hunerî (her tiştekî ciwan) da cihgire neku di naxê medaye çunku eger was be dê rolê avirînerî jibo dirustkirina kevalekî ciwan hête jidest dan lewra (kimal heraqî) jî boçûna dûmahyê û (ligor dîtina min) Kemal biserkeftîyane afirandina domkirineka rasteqîne dinavbera boşatyên hunerî dikevalên xweda peydake û bike pireke bihêz ku berihemên wî ji hundirive bi cîhana der vey ve girêdde û di encamde peçirwîmeka xurt û peywendîyek e zînde bêne pêş û tevlî hevîyek e xwezayî dinav herdû layenada durist dibe wesa liwergirî dike hest bivan kevalan bike hembêza jîyaneke hesitîdarin dirêka çavên yên pişt tiştî binahîra dibînin û dilên nazidar ku bikarin ciwanyê û rindîya veşartî hest biken û bihevre dikarîger bin, gutara (kimal heraqî) xwedan gelek ramanên mirovatyêne yên bi nirx û biha girane, mirovî radikêşne cîhaneke mişt ji elndên reng û reng û dibine têkistekî qeşeng û dewlemend ji kinarê ramanave û dirêya gelek kevalên surda (kimal) karî ye ciwanyê û bedewîya jinê xoyadke ku di binîyatda sirudên hezkirinê yên veşartîne, (kimal) aşikira dike bizîrekî û şarazayî xwe bilind diwarê derbirînê û teknîka gutara (dîtinê) ra… Liberamberê kevalên (kimal) mirov hest dike ku şah karekî mişte ji ciwankaryê û afirandinê û bal rakêşyê û wergirî dike xwedan peydarî û berxwedaneke lawaz û wisa fam dike ku nîgarikêş aşiqî serusîmayên mirovatyê helbet têgeh û êdîyemê (ticirîdî) amajedaneka vîlusufîyane ye jibo pirusêsa hizirî yaku lipey wî dorxistina hizran ji keristeyan û cudakirina tîwrîyan ji bîyava piraktîkî û (Kemal) jî wisa fam dike lewra kevalên wî hizir dinav rengan da divestirayne û dibe xwedî pîverên karîwnên afirandinî bin bilind lidemê em qala hunerên ku biçavan têne xwandin û famkirin bike pêwîst e bizanin ku ew navindeke (rêgayek e) dinavbera afirandina hunermendî û tamkirin û lezeta wergirî çunke hebûna afirênerî bingehe jibo hebûna hunerî eger na çawa dê berihemên hunerî di bal kêş bin û xwedan kartêker bin liser wergiran ku ew xwedan birîyarin liser hebûn û astê vî berihemê hunerî yên ku zêndî dimîne sereray sal û deman, raste hunermend ziman halê serdemê xwe ye lê carina jî dibe serkêş û dipêşîya serdem û xercê xwe dimeşe û hertim niwejenkirin û nwîkirin û cudakirinê bixwer dîne, divan ropelên xwarêde ez pêkolê bikem hinek têgehiştin û dîtin û boçûnên xwe lidor çend kevalên hunermend (Kemal heraqî) bînme ser ziman, dibe ez û wergirekî din lihev nînin liser ramana û boçûna lidor yek kevalî evejî nîşana serkeftina kevalî û cudahîya hizir û bîrên me ye.. Dîtinên min ligur hizir û raman û

têgehiştinên min dibe hinek dikurt bin û hinek jî ne û heta çi radey ez yê serkeftî bûm, bila birîyar ya vekirîbe.

Kevalê - 1 -

Ez gelek liber vî kevalî rawesitîyam çunke piranîya kesên Kurdistanê dîmenê pêşimergên Kurdistanê lidemê rojavada hêdî hêdî û yek û bîyek berev gundan dihatin dîtine, û bisedeha hîvî û awatên paşerojeke geş bixwere danîn, raste tirs hebû hejarî bû û çavên rijêma bexda yên sur weku guran liser hemû rê û durîyan û newalan di vekirî bûn, lê gundîyan xweşîyek jî ji wê azadyê di gotinên pêşimergan didîtin û dizanîn ku xebat û kartêkirin jibo serfirazî û rizgarîya wan, û pêşimerge wekî demjmêrî nedirawesta dilvlivîneke berdewam de bûn, lê piştî serihildana adarê dem û heywan hatine guhartin, keristên pêşimergan weku çantik û cil û berg û gureyên hiryê û gupal û tiveng û çek berev nemanê çûn û qûnax hate guhartin heta geha wî radekî peyva pêşimerge, pîrozîya xwe weku berê nema! Belku her jidest daye.



Kevalê jimare - 2 -

Banurama tiracîdîya enfalên reş yên ku kotirên aştyê li sêdarêdan û girtin û bê seroşwînkirina kurdan diwêrankirina gundan û... Hitid lê pişti serihildana (1991) ropelekî nwî dijîyana Kurdistanîyanda hate vekirin û mixabin zu bizu enfalkerên Kurdistanê hatine jibîr kirin wiberî xelkê Kurdistanê kete uropa..



Kevalê jimare - 3 -

Hizra vî kevalî vedigirte ser wan (72) fermanên biser civatgehê êzdîyan ra derbas bûyîn, kotir sembola êzdîyatê dike wek civatgeh û (72) parçên wî tevî (72) çibkên xwînê ji leşê wê kotirîvebûyine lê her ew liber xwe dide qubên laliş nîşana êzdîyatyê dide dîn û kelitur widîrok xoyaye ku hinek deriz wişkestin ketine dinav qoba da lê xwe gurîkirin û ber xwedan û peydarî û erd witarî û mij û roj (azadî) wigelek sembolên din bixove digire.



Kevalê jimare - 4 -

Di vî kevalî da (Kemal) dixwaze civatgehî hişîyar bike wibêja wan ku perêsgeha laliş eger nehête nujenkirin lidemekî kurtda dê berev çarenivîsekê reş di çe û pêwîst e mesela ketixwarên dahatîyya laliş bête çareserikirin û mişik û tevnibîrikan ji lalişê dûrbêxin.

Kevalê jimare - 5 -

Dipir kevalên xweda (Kemal) hewil dide rêvebirina laliş bilawaz û şaşî bîne berçavan wipşt guhavtina wê jilayê mîrê şîxan ve wibê putekirina ji layê hikûmeta herêma Kurdistanê ve, birîyara mîrê Şêxan da lidor avakirina sinduqekê bo xêr û xêratan û harîkarîya qutabî û belengazan bike, lê evê birîyarê runahê nedît û hate tecmîdkirin belê çaverînîya belingazan ma wihîvî û awatên wan nemirin.

Kevalê jimare - 6 -

Azadîya jinê û şkandina şivşên asnê bendîxana civatgehî û berxwedan û xebatkirin jibo bidestiveanîna hemû mafên jinan nemaze yeksanî ligel mêran... Aştî (kotir) û jin dû alavên nêzîkî heven, lê mêr negelek yê harîkare belku carina jî rêgirin jibo azadî û serxobûna jina Kurdistanî.

Kevalê jimare - 7 -

Rolê bingeh û senterên rewşenbîrî yên êzdîyan di karkirina wan dibin bandora partên Kurdistanîda û her yek ligor sîyaseta xwe êzdîyatyê dide naskirin û peywendiyên wan bihevre di lawazin tenê êzdîyatî wan bihevre girêdde.. (Kemal) ji vê rewşa hanî neyî razî ye..

Kevalê jimare - 8 -

Wêneyê herdû şehîdên serikirde û herdem zîndî (mihmud êzdî-hisîn babe Şêx) bi cilên zer û kesk û dilopên xwînê yên herdûya teflî hev bûyine, nîşana pişkdarîya êzdîyan dişoreşên kurdî da mil bi mil ligel hemû tiwêj û texên milletê Kurdistanê wiberdewamî bixebata xwe dayine û dibinira mehîneka bê siwar mayî beref desthelat (perlemanî) diçe û berê xwe dide ala Kurdistanê.



Kevalê jimare?

Mirin–Bê umêdî-kuştin-jin–Mar-tarstanî -xwîn.

Kotirên birîndar û kuştî... Bidehan sembolên cuda cuda bixove digirin ev kevalne pir çîrok û dastan û bûyerên giring ji Kurdistanê bixove digire û temaşavanê van kevalan ligor hizir û bîrên xwe şiroveyên xwe bîne serziman lewra ez dibînim baştir e eger xweyndevan gerîyanekê di malpera nîgarikêşî (Kemal heraqî) da bike ûw. Kamalharaqi. De